

PAPER DETAILS

TITLE: Ferhengên Menzûm Di Edebîyata Kurdî De

AUTHORS: Nusrettin BOLELLI,Nurettin ERTEKIN

PAGES: 21-44

ORIGINAL PDF URL: <https://dergipark.org.tr/tr/download/article-file/392541>

FERHENGÊN MENZÛM DI EDEBÎYATA KURDÎ DE

Klasik Kürt Edebiyatında Manzum Sözlükler Verse Dictionaries In Classical Kurdish Literatur

Nusrettin BOLELLİ¹ Nurettin ERTEKİN²

KURTE

Ji bo perwerdehiya zarokan di edebiyata rojhilata navîn ya klasîk da gelek ferhengên menzûm hatine amadekirin. Edebiyata Kurdî ya klasîk perçeyek ji edebiyata rojhilata navîn ya klasîk e û wek hemû cureyên edebiyata klasîk, ji bo perwerdehî û fêrkirina zarokên kurdan ferhengên menzûm jî hatine amadekirin. Di edebiyata Kurdî ya klasîk de li gor çavkaniyên berdest heşt ferhengên menzûm hene. *Nûbihara Biçûkan*, *Mîrsadul Etfâl (Şahrahê Kudekan)*, *Luxetnameyê Ehmedî*, *Gulzar*, *Dû Rîşte*, *Nûbihara Qur'anê*, *Nûbihara Mizgefta Sîriyê* û *Nûbihara Mezinan*.

Di vê gotarê de em li ser ferhengên menzûm ên di edebiyata Kurdî ya klasîk de disekinin. Kurtejiyana nivîskarên ferhengên menzûm û hêjmara beş, beyt, bêjeyên ferhenga di vê gotarê de bi cih bûye.

Bêjeyên Sereke: Edebiyata Kurdî ya klasîk, Ferheng, Ferhengên Menzûm. Ferhengên Menzûm ên Edebiyata Kurdî ya klasîk.

ÖZET

Klasik Ortadoğu edebiyatında çocukların eğitim ve öğretimi için manzum sözlükler hazırlanmıştır. Klasik Ortadoğu edebiyatının bir parçası olan Klasik Kürd edebiyatında da klasik edebiyatın bütün edebi türleri gibi, kürd

1 Doç. Dr., Mamosteyê Beşa 'Erebî, Zanîngeha Bingölê.

2 Xwendekarê Lisansa Bilind a Bi Tez.

çocuklarının eğitim ve öğretimi için manzum sözlükler de hazırlamışlardır. Kaynaklardan edinilen bilgilere göre Klasik Kürt edebiyatında sekiz manzum sözlük yazılmıştır. Nûbihara Bîçûkan, Mîrsadul Etfâl (Şahrahê Kudekan), Luxetnameyê Ehmedî, Gulzar, Dû Rîşte, Nûbihara Qur'anê, Nûbihara Mizgefta Sîriyê ve Nûbihara Mezinan.

Bu makalede Klasik Kürt edebiyatında bulunan manzum sözlükler üzerinde duracağız. Manzum sözlük yazarlarının kısa biyografileri, sözlüklerin bölüm sayıları, beyit sayıları, kelime sayıları bu makalede yer almıştır.

Anahtar Kelimeler: Klasik Kürt Edebiyatı, Sözlük, Manzum Sözlük, Klasik Kürt Edebiyatında Manzum Sözlükler.

ABSTRACT

Many poetical dictionaries have been written for the education and the teaching of children in the Classical Middle East Literature. As a part of the Middle Eastern Literature, Classical Kurdish Literature has also given many products in the same field. According to the studies done in the field, eight dictionaries have been written in this style: *Nûbihara Bîçûkan*, *Mîrsadul Etfâl* (*Şahrahê Kudekan*), *Luxetnameyê Ehmedî*, *Gulzar*, *Dû Rîşte*, *Nûbihara Qur'anê*, *Nûbihara Mizgefta Sîriyê* and *Nûbihara Mezinan*.

I will discourse on the poetical dictionaries in this article. The lives of the writers of these authors, the number of the sections, the number of couplets and the number of the lexical items are researched.

Key Words: Classical Kurdish Literature, Lexicon, Poetical Dictionary, Poetical Dictionaries in the Classical Kurdish Literature.

DESTPÊK

Dîroka ferhenga bi qasî dîroka nivîsê kevn û kevnare ye. Piştî peydakirina nivîsa mîxî ji teref Sumeriyan ve, nivîsa mîxî di mektebê Sumeriyan de ji bo perwerdehiyê hatiye bikaranîn. Piştî desthilatdariya gelên Samî li ser Sumeriyan, ziman nasên Sumerî ji bo ku xelkên Samî zimanên wan fam bikin ferhengên herî kevn ê dîroka mirovayetiye nivîsandine.³

Xebatên gelên Çînî li ser ziman, heta berya zayinî bi sedsala XI a paşve diçe. Tê zanîn ku, Ku Ye Wang ferhengê bi navê 'Yu Pi En' û Şi Wo Wan jî bi navê 'Hu Şin' ferheng amadekirine. Hîndûyî ya xebatên xweyî ziman, di destpêkê de, li ser tekstên pirtuka xweyî pîroz *Weda* pêkanîne. Ziman nasê Hîndûyî Panînî

3 Yusuf Öz, (1996), *Tarih Boyunca Farsça-Türkçe Sözlükler*, Ankara Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü, (Yayımlanmamış Doktora Tezi), Ankara, r.1

ferhengek menzûm bi navê ‘*Ashtadhyayi*’ nûsiye û ev ferheng gihaştîye dema me jî.⁴

Yûnaniyan, ji bo hin bêjeyên ku di *Îlyada* û *Odessia* Homeros de derbas dibin û ji bo bêjeyên pirtûkên felsefevanên wek Eflatûn, ferhengên taybet nûsîne. Ferhenga Yûnaniyan a herî kevn ‘*Onomasticon*’ a Jûlius Pollux e. Ev ferheng deh berg e.⁵

Xebatên ‘Ereba li ser ziman û ferhenga, piştî hatina dînî Islamê destpê dike. Ev xebat hewl dana baş famkirina herdû çavkanîyên dînê Îslamê ên sereke; Qurana Pîroz û Hedîsê Resûlê Xweda ne. Ferhenga bi navê *Kîtab-ul ‘Eyn* ku ji teref ‘Ebdurrehman El- Xelîl b. Ehmed b. ‘Emr el- Farahîdî hatiye nivîsandin di zimanê ‘Erebî de ferhenga yekemîn e.⁶

Di edebiyata Farisa de, ferhenga bi navê ‘*Tefasîr fî Lugatê Furs*’ an ‘*Muntehab*’ û an bi navê ‘*Muntehabê Hakîm Qetrqan*’ tê bilêvkirin, ku Qatranê Tebrîzî nivîsandiye, yekemîn ferheng e. Ev ferheng ne gihaştîye roja me. Ferhengên edebiyata Farisan ên herî kevn ku gihaştine dema me a yekemîn; ‘*Lûgatê Fûrs*’ a Esedê Tûsî ye, duwemîn ferheng bi navê ‘*Şîhab-ul Furs*’ ji aliyê Muhemmed b. Hinduşahî Nahciwanî ve hatiye nivîsandin. Ferhenga sisiya, ‘*M’iyarî Cemalî*’ ya Şemsê Fehrî ye.⁷

Di edebiyata Tirkî de yekem ferhengên ku hatine nivîsandin, ‘*Dîwan ü Lugat-it Turk*’ û ‘*Tibyan-ul Lugat-it Turk ‘ela Lisan’îl-Kanklî*’ ye ku a yekem, nivîsa Kaşgarlı Mehmûd e û a duwem, Muhemmed b. Keys nivîsandiye.⁸

Di edebiyata Kurdî de li gor jêderên ber desta yekem ferhenga kurdî ji teref Seyx Ehmedê Xanî bi navê ‘*Nûbihara Biçûkan*’ hatiye nivîsandin.⁹ Ev ferheng ji ber ku menzûm e dinav mijara me de bi ber firehî ewê cih bigre.

1. FERHENGÊN MENZÛM

1.1. Dîroka Ferhengên Menzûm Di Edebîyata Rojhelata Navîn De

Li gor tespîtê ku hatine kirin di sedsala V / VI an de em rastî ferheng û pirtûkên rêziman ên menzûm tên. Di vî warî de berhemên herî pêşî hatine nivîsandin; ‘*Kaydû’l-Evâbid*’ a şaîr û zimannasê Yemenî Îsmail b. Îbrahim er-Rib’î, ‘*el-Mufasssal*’ a Zemahşerî, ‘*Teshîlû’l-Fevâid ü Tekmîlû’l-Makâsîd*’ a İbn Mâlik, ‘*Düstûru’l-Lugâ*’ ya Edîb Natanazzî ye.¹⁰

Dîroka ferhengên menzûm û du zimanî, di sedsala XIII da bi ‘*Nisâbu’s-Sıbyân*’ a Bedreddîn Ebû Nasr Mesûd (Mehmûd) b. Ebî Bekr el-Ferâhî dest pê dike. Di

4 Öz, hb, r.2

5 Öz, hb, r.2

6 Öz, hb, r.4

7 Öz, hb, r.20-23

8 Öz, hb, r.37

9 Kadri Yıldırım, (2014), *Ehmedê Xanî Külliyyatı IV- Dîwan*, Awesta yayınları, İstanbul, r.18

10 Öz, hb, r.53

heman demê de ‘Zühretü’l-Edeb’ a Şükrullâh b. Şemsüddîn Ahmed b. Seyfuddîn Zekerîya minaka duwem e ji bo ferhengên menzûm û du zimanî.¹¹

Edebiyata Tirkî, ku di bin bandora edebiyata ‘Erebî û Farsî de maye, em ferhengê menzûm cara yekem bi berhema Hüsâm b. Hasan el-Konevî’ a bi navê ‘Tuhfe-i Hüsâm’ dibînin.¹² Ev ferheng bi Farsî û Tirkî ye. Ferhenga bi zimanê ‘Erebî û Tirkî ji teref Abdullatif İbn Melek bi navê ‘Lugat-i Ferîşteoğlu’ hatiye nivîsandin.¹³

Di serî de ‘Tirkî-‘Erebî’, ‘Tirkî –Farsî’ û ‘Tirkî-‘Erebî-Farsî’ bi du zimanî û sê zimanî ferheng hatine nivîsandin, lê ji sedsala 19 a û vir de, bi Rûmî, Ermenî, Bulgarî, Almanî, Boşnakî û Fransîzî ji ferhengên menzûm di edebiyata Tirkî de xwe nîşan didin.¹⁴

Di edebiyata Tirkî ya klasîk de heta vê deme; Farsî-Tirkî (24), Farsî-‘Erebî-Tirkî (14), ‘Erebî-Tirkî (12), Farsî-Farsî (1), ‘Erebî-Farsî (5), Tirkî-Rumî (2), Tirkî-Fransîzî (1), Tirkî-Bulgarî (1), Tirkî-Ermenî (1), Tirkî-‘Erebî-Farsî-Afganî-Hindûyî (1) û tevî ferhenga di dîwana Nevaî de ku bêjeyên zimanê Çağatayî û Moğolî destnîşandike bi giştî 63ê ferhengên menzûm hatine dîtin.¹⁵

Di edebiyata Tirkî ya klasîk de ji bo ferhengên menzûm ev berhemên li jêr wek nimûne em di karin pêşberî we bikin: Bahâ’üddîn İbn Abdurrahmân-ı Magalkaravî - *Ucûbetü’l-Garâyib fî Nazmî’l-Cevahiri’l-Acâyib* (827/1424), Şeyhülharezmî - *Lugat-i Abdülkerîm* (978/1570), Sun’î-i Malatyavî - *Fethü’l-Fettâh* (1008/1599), Kayserili Gencî Pir Mehmed - *Genc-i Leâl* (1041/1631), Mustafâ Hâkî el-Üsküdarî - *Menâzîmü’l-Cevâhir* (1042/1632-33), Abdurrahman Zâhidî-i Konevî - *Tevfiye* (1133/1721), Şeyh Ahmed-i Antakî - *Se Zebân* (1135/1723), Eşref Feyzî - *Lugat-i Feyzî/Hoş Edâ* (1149/1736), Ahmed Resmî b. İbrahim-i Girîdî - *Nazm-ı Girîdî* (1153/1740), Mustafa İlmî b. İbrahim - *Tuhfetü’l-İhvân ve Hediye’ü’s-Sıbyân* (1160/1747), Mustafa Keskin b. Osmân - *Manzûme-i Keskin* (1171/1758), Osman Şâkir b. Mustafâ-yı Bozokî - *Müselles-nâme-i Şâkir* (1210/1795-96), Hasan Aynî - *Nazmü’l-Cevâhir* (1236/1821), Hayret Mehmet Efendî - *Tuhfe-i Se-Zebân* (1234/1819), Çemişkezekî Nasûh Efendî - *Tuhfe-i Nushî* (1839-1861 arası), Süleyman Hayrî - *Hayrî’l-Lugat*.¹⁶

11 Öz, hb, r.54

12 Mustafa Öztürk, (2015). “Manzum Sözlüklerden Sübha-i Sıbyân ile Kürtçe’deki İlk Manzum Sözlük Nûbehara Biçûkan Arasında Bir Karşılaştırma”, Mardin: The Journal of Mesopotamian Studies, C: 1/1, s. 5.

13 Öztürk, hb, r.5

14 Öztürk, hb, r.5

15 Yılmaz İnce, (2002). “Manzum Sözlükler ve ‘Şemsî’nin Cevâhirü’lkelimât’ı Üzerine Bir Dil İncelemesi”, Elazığ: Fırat Üniversitesi Sosyal Bilimler Dergisi.

16 Kamil Ali Gıynaş, (2015). “Arapça-Farsça-Türkçe Manzum Bir Sözlük: Tuhfetü’l-İhvân Hediye’ü’s-Sıbyân”, Uluslararası Sosyal Araştırmalar Dergisi, C.8, S.41, s.154-163.

2. FERHENGÊN MENZÛM DI EDEBIYATA KURDÎ DE

Hemû taybetmendiyan edebiyata klasîk, cureyan edebiyata klasîk di edebiyata Kurdî de jî xwe nîşan didin. Çawa ku ferhengên menzûm wek cureyek edebî jî bo perwerdehiyê hatine amadekirin di edebiyata rojhilata navîn de, her wiha ‘alim, zana, ziman nasên kurdan jî ev cûre pejirandine û jî bo perwedehiyê û fêrkirinê berhemên ferhengên menzûm diyarî zarokên Kurdan û edebiyata Kurdî kirine.

2.1. Şeyx Ehmedê Xanî û Nûbihara Biçûkan

2.1.1. Şeyx Ehmedê Xanî (1651-1707)

Şeyx Ehmedê Xanî, Di sala 1650/51 li Bazîdê ji dayik bûye. Navê bavê wî Melle Îlyas e. Piştî wefata bavê xwe li cem birayê xwe Melle Qasim dest bi xwendina medresê dike. Li Mûradyê di medresa Gulgûnê, li Ahlatê, Ruha, Cizîrê, û wd. Xwendina xwe di domîne û li Xoşabê di medresa Ataiyye de li cem Melle Camî icaza ‘ilmê werdigre.

Piştî kuta kirina tehsila ilmî vegehiyaye Doğubeyazitê. Li vir medreseyek ava kiriye û dest bi dersdayînê kiriye. Şeyx Ehmedê Xanî, hem ‘alimekî Îslamê ye û hem ‘alim û zanayekî kurd e. Li ser baweriya Sunnî/Eş’erî peyrewê mezhebê Şafî’î ye. Şeyx Ehmedê Xanî girêdayî terîqa Neqşebendî ye. Heta îro çar berhemên wî gihaştine ber destê me. *Mem û Zîn*, *Nûbihara Biçûkan*, *‘Eqîda Îmanê û Dîwan* berhemên wî ne.¹⁷

2.1.2. Nûbihara Biçûkan

2.1.2.1. Navê Berhemê yê Orîjînal

Navê berhemê *Nûbihara Biçûkan* e. Wek taybetmendiyeke ferhengên menzûme ku nivîskar navê berhemê di hundurê berhemê de û di beşa yekem, an di destpêkê de bilêv dikan, Şeyx Ehmedê Xanî jî ev taybetmendî bikaraniye û di destpêkê de navê berhema xwe anîye ziman.¹⁸

Vêk êxistin Ehmedê Xanî

*Navê Nûbihara Biçûkan lê danî*¹⁹

2.1.2.2. Sedema Nivîsînê û Mêjûya Nivîsandina Wê

Dîsa yek ji taybetmendiyan ferhengên menzûm in ku nivîskar sedema nivîsandina berhemê diyar bike. Şeyx Ehmedê Xanî di destpêka berhemê de di

17 Kadîr Yıldırım, hb. r.13-14

18 Di vê xebata li ser Nûbihara Biçûkan de me berhema Ehmed Hilmî Qoxî ya bi navê Gulzara Hemûkan Şerha Nûbihara Biçûkan, weşanên Îhsan, çapa sêyem, sal 2014 ji xwere kir çavkanî.

19 Ehmed Hilmî Qoxî, (2004), *Gulzara Hemûkan Şerha Nûbihara Biçûkan*, Îhsan yayinlari, 3. Baskı, İstanbul, r. 17

beyta 7 an de sedema nivîsandina *Nûbihara Biçûkan* dibêje ku ev behrem ji bo zarokên kurmanca hatiye amadekirin.

Ne ji bo sahip rewacan

*Belkî ji bo biçûkê kurmancan*²⁰

Şeyx Ehmedê Xanî ev berhem xwe di sala 1683 an de nivîsîye.²¹

2.1.2.3. Taybetmendiye Şiklî

Nûbihara Biçûkan, ferhengê Kurdî- ‘Erebî ye. *Nûbihara Biçûkan*, ji destpêkekê û 13 beşan - ji bo beşên ferhengên menzûm Qit’e dibêjin²²- pêk hatiye. Beşa herî mezin beşa dawî ya sêzdeha ye ji 48 beyta pêk hatiye. Beşa herî biçûk jî beşa pêncan ye ji 7 beyta pêk hatiye.²³

Bi wezn û qalibên ‘erûzê hatiye nivîsandin. Heft qalibên ‘erûzê ku; Hezec, Recez, Remel, Mûdari’, Besît, Serî’ û Mûteqarib in hatine bikar anîn. 4 beş bi behra Recezê, 3 beş bi behra Hezecê, 2 beş bi behra Remelê û bi behra Mûdari’ beşek, Besît beşek, Serî’ beşek û Mûteqarib jî beşek hatiye nivîsandin.

Hejmara beytên berhemê 217e ne. Di pirtûka Qoxîde du beytên din jî hene, Qoxî di van herdû beytan de ketiye şikê ku ji *Nûbihara Biçûkan* in an na. Ev herdû beyt ev in:

Divêtin tû bizanî bi dil navê îmaman

‘Elî çar in Hesên du Mûhemmed sê ne ey can

Imamê dî Huseyn e di gel Mûsa û Ce’fer

Ev in bîl cumle bê şek bizan qencê îmaman

Ji bo me çarî dîtir heyîn sahip mezahip

Mûhemmed Malîk Ehmed ewî dîtir ki Nî’man²⁴

Eger ev herdû beyt jî bîn jimartin hejmara beytên berhemê dibe 219e. Bi tevahî 852 bêjeyên Kurdî û 1317 bêjeyên ‘Erebî, bi giştî 2169 bêje di berhemê de bi cîh bûne.²⁵

Beşa destpêkê bi Besmeleyê destpê dike, bi Hemdele û Selweleyê dewam dike. Navê nivîskarê berhemê, sedema nivîsandina berhemê jî di destpêkê de bi cîh bûye. Di beşa yekem de, hinek bîr û baweriyên dînê Îslamê; navên her çar xelîfeyên Îslamê, ew deh kesên ku bi bihiştî hatine mizginkirin, û bi çar beytan kurtasiya jiyanê peyxemberê Îslamê tê dîtin.

20 Qoxî, hb, r. 17

21 Kadî Yıldırım, hb, r. 25

22 Öz, hb, r.62

23 M. Zahir Ertekin, “İlk Manzum Türkçe-Kürtçe Sözlük: Nûbihara Mezinan”, Journal of Oriental Scientific Research (JOSR), Nisan-2017 Cilt:9 Sayı:1 (17), r. 94

24 Qoxî, hb, r.19

25 Ev hejmar li gor tesnîfa Qoxî ku li dawîya pirtûkê li gor herfê elîfbayê dabeşkiriye me jimartiye.

Beşa destpêkê ne tê de, beşên mayin bi pend û şîreta destpê dike. Di serê her beşekê de beyta yekem ji bo pend û şîretan hatiye veqetandin. Wek nimûne di serê beşa yekem de ev pend heye:

*Heta tu dewr û dersan nekî tekrar û mesrûf
Di dunyayê tu nabî ne meşhûr û ne me'rûf²⁶*

Dîsa ku beşa destpêkê em ji nav derxin di beşên din de beyta duwem behr û qalibên 'erûza wê beşê nîşan dide. Wek mînak ji beşa hefta;

Fa'îlatun, Fa'îlatun, Fa'îlatun, Fa'îlat
Xweş tu vê behrê bixwîne lew ku xweş çûne Remel²⁷

2.1.2.4. Taybetmendiyên Nûbihara Biçûkan

Di edebiyata Kurdî de ferhenga yekem e.

Di edebiyata Kurdî de ferhenga menzûm a yekem e.

Di edebiyata Kurdî de ferhenga du zimanî a yekem e.

Di edebiyata Kurdî de di warê mijara 'erûzê de berhema yekem e.

Di edebiyata Kurdî de ji bo perwerdehiya zarokan berhema yekem e.

Di dîroka zimanê Kurdî de ji bo perwerdehiya zimanê zikmakî berhema yekem e.²⁸

Di Nûbihara Biçûkan de Hejmara Beyta, Behr û Qalibên 'Erûzî û Mînakên Beyta			
Beş	Hejmara Beyta	Behr û Qalibên 'erûzê	Beytek Jê Beşê
Destpêk	14		Hemd û Sena û Şukranî
			Ji bo wî Xaliqê Rehmanî
		Hezec	Li me fêrde bizanin restûlê xwî bi tehqîq
1	15	Mefa'îlun, Fe'ûlun, Mefa'îlun, Fe'ûlun	Bi mewlûd hem bi medfen bi nasin da û baban
		Recez	Zewc û recûl çî? Mêr, û jin, meret û zewcet û nîsa
2	15	Mufte'îlun, Mefa'îlun, Mufte'îlun, Mefa'îlun	Walid bab û walîde da, şeçqî û ex her dî; bîra
		Remel	Qidre dîze, qes'e kase, xubzê nan
3	11	Fa'îlatun, Fa'îlatun, Fa'îlat	Lehmê goşte, tebxê pehtin, neyê xav
		Recez	Hatim eteytû, atî tîm, wî hat eta, tî were
4	11	Mustef'îlun, Mustef'îlun, Mustef'îlun, Mustef'îlun	E'teytû minda, xuz bigir, îrcî veger, izheb here
		Recez	Meqtûlî kuştî, mexsûlî şîstî
5	7	Mustef'îlatun, Mustef'îlatun	Meytet mirar e, merqed xwî gor e
		Mûdarî	Rumman hinar e, culnaz gulnar e, tîn hijîr e
6	11	Mef'ûlu, Fa'îlatun, Mef'ûlu, Fa'îlatun	Qissa xiyar e, dewfes pîvaz e, sewmî sir e
		Remel	Şeyx û sofîî keramet 'îlm û xwendin hem'emel
7	18	Fa'îlatun, Fa'îlatun, Fa'îlatun, Fa'îlatun	Xîhwet e hîcre, terîqa te şerîfet bê xelêl
		Besîl	Hîvinemayî kî ye? Mublis û ayis qenûl
8	18	Mufte'îlun, Fa'îlun, Mufte'îlun, Fa'îlun	Asîn û pola çî ne? Herd û enîs û zeker
		Hezec	Zahîb çî ye? Ê çûyî, musteqbelî; ê bêtin
9	10	Mef'ûlu, Mefa'îlun, Mef'ûlu, Mefa'îlun	Madî çî? E wê borî, baqî çî? E wê mayî
		Recez	Mufte'îlun, Mufte'îlun, Mufte'îlun, Mufte'îlun
10	9	Mufte'îlun, Mufte'îlun, Mufte'îlun, Mufte'îlun	Ev recez a metwîyye da qenc bizanî tû bira
		Hezec	Herçî kesê 'îlmekî qenc xwendîye
11	16	Mufte'îlun, Mufte'îlun, Fa'îlun	Dewlet e ger wî bi esl zaniye
		Hezec	Bîzan çar in 'enasir; ax û av û ba û agir
12	14	Mufte'îlun, Mefa'îlun, Mufte'îlun, Mefa'îlun	Mewalîdin ev e hersê; nebat û me'den û heywan
		Mûteqarîb	Zivistan şîlaye û havîn e seyf
13	48	Fe'ûlun, Fe'ûlun, Fe'ûlun, Fe'ûl	Behar e rebî û peyîz e xureyf
Gîştî	217		

26 Qoxî, hb, r.17

27 Qoxî, hb, r.42

28 Di amadekirina statîstîk û tabloyên vê gotarê em spasîyên xwe pêşkêşî momoste M. Zahir Ertekin dikin.

2.2. Şeyx Mihemed Kerbelayî û *Mîrsad'ul Etfâl ew Şahrahê Kûdekan*

2.2.1. Şeyx Mihemed Kerbelayî (1886-1939)

Şeyx Mihemed Kerbelayî, lawê Şeyx 'Ebdurrehman Aqtepî ye. Di sala 1886ê zayinê li gundê Aqtepê girêdayî bi navçeya Çinar (Xana Axpar) a Dîyarbekir hatiye dunyayê. Di medreseya Aqt epe de li cem bav û apê xwe dest bi xwendinê dike. Temamê xwendina xwe di medresa malbata xwe didomîne. Piştî têkçûna serhildana Şeyx Se'îdê Kal nefî/sirgûnî bajarê Êşaqê dibe. Paşê nefya wî difetilînin bajarê Edeneyê. Piştî du salê nefyê tê bexşandin û vedigere welat li gundê Çolî bi cih dibe. Şeyx Mihemed Kerbelayî, piştî ku li vî gundî bi cih dibe jiyanek inzîwayî dimeşîne. Kêm dixwe, kêm vedixwe, kêm radikeve, dixwîne, dinivîsîne û nivîsê xwe diçerîne. Di sala 1939ê zayinî rehmîet dike diçe ser dilovaniya xwe. Di destê me de jî Şeyx Mihemed Kerbelayî du behrem hene. Yek *Dîwan* û a din jî ev ferheng e ku navê wê *Mîrsadu'l-Etfâl ew Şahrahê Kûdekan* e.²⁹

2.2.2. Navê Berhemê yê Orîjînal

Şeyx Mihemed Kerbelayî, navê berhema xwe di destpêka berhemê de weha diyar dike:

Bi Mîrsadu'l-Tîfal min kirye nîşan

*Ji mewla min rica ye nefê îşan*³⁰

2.2.3. Sedema Nivîsînê û Mêjûya Nivîsandina Wê

Kerbelayî, bi giştî jî bo temamê zarokên Kurdan û bi taybetî jî, jî bo birayê xwe Muhemmed Eskerî û biraziyê xwe Neqşibendî nivîsandiye. Ev berhem di sala 1912 an de hatiye nivîsandin.³¹

Li ser Etfâl û ewladê di Kurdan

Lîsanê Farisî û meqsedê wan

Muhemmed Eskerî yû Neqşibendî

*Ew in îlet jî vê tertîb û bendî*³²

2.2.4. Taybetmendiyên Şiklî

Mîrsad'ul Etfâl ew Şahrahê Kûdekan ferhenga Kurdî- Farsî ye. Ferheng, jî destpêkêkê, 15 beşan pêk hatiye. Di ferhengê de 1155 bêje cih girtine. Ferheng mevzûn e bi tevahî ev ferheng jî 320 beyta pêk hatiye. Bi behr û qalibên êrûzî

29 Şeyx Mihemed Kerbelayî, (2002), *Dîwana Kerbelayî*, amd. Osman Akdağ-Kerem Soylu, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol, r. 7-10

30 Pertev, Ramazan. (2012), *Mîrsadul Etfâl (Şahrahê Kudekan)* -Ferhenga Menzum a Kurdî-Farîsî(vekolîn-Tekst), Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtûya Zimanên Zindî yê li Tirkîyeyê, Şaxa Makezanîsta Ziman û Çanda Kurdî, Teza Lîsansa Bilind, Mêrdîn, r.47

31 Pertev, hb, r,49

32 Pertev, hb, r,48

hatiye nivîsandin. Behrên 'erûzê ku hatine bikaranîn; Hezec, Recez, Munserîh, Serî', Remel, Mûzarî', Wafir û Mûtekarîb e.³³

Di serê her beşê de beyta pend û şîreta û dûre benda behr û qalibên 'erûza wê beşê bi cih bûye.

Îlim ez behrê insan dewletê dunya û 'uqba ye

*Kesê 'alim muheqqeq tacidarê her du dunya ye*³⁴

Mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun

Hezec salim musemmen bit şebîhê durrê yekta ye

Di Mîrsad'ul Etîfâlê de Hejmara Beyta, Behr û Qalibên 'Erûzî û Mînakên Beyta³⁵

Beş	Hejmara Beyta	Hejmara Bêjeya	Behr û Qalibên 'erûzê	Beytek Jê Beşê
Destpêk	25		Hezec	Bi ismê padişahê 'alemârây
			Mefa'îlun mefa'îlun fe'ûlun	Bi hemdê zî'î-celalê nutqî beşşay
1	15	98	Hezec	Îlim ez behrê insan dewletê dunya û 'uqba ye
			Mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun	Kesê 'alim muheqqeq tacidarê her du dunya ye
2	18	99	Recez	Mustefîlun Mustefîlun Mustefîlun Mustefîlun
			Mustefîlun Mustefîlun Mustefîlun	Salim musemmen bit recez, mislê mûhîta Hindî ye
3	19	86	Munserîh	Cam û peyale qedeh, encomen e cemiyet,
			Mufte'îlun fa'îlun mufte'îlun fa'îlun	Mêrg e bizan sebzazar, bexwedî ye bineva,
4	16	63	Hezec	Naskim e şînaştin, hem sûrax e qulik, ey can,
			Mef'ûlun mefa'îlun mef'ûlun mefa'îlun	Rakim e çi? engîştin, hem walide ye marî,
5	12	41	Recez	Bisyar û bes pur pûr, û poser kur,
			Mustefîlatun mustefîlatun	Mox çi ye? kafir, çûyîn e reffen,
6	18	46	Serî	Çapik û çalakî sivikbûyîn e,
			Mufte'îlun mufte'îlun fa'îlun	Çeste çi? Nexme, keşel e hem çeseng,
7	7	30	Recez	Elîxten û elîxîten elîfden û endûxîten
			Mufte'îlun Mufte'îlun Mufte'îlun Mufte'îlun	Herçar berhevdan e, hem qasid e olax, insan e kîk
8	25	94	Remel	Edl û muhlet hesret û te'cîl û tîrs
			Fa'îlatun fa'îlatun fa'îlun	Zînihar e, zîver e zînet yeqîn!
9	13	51	Mûzarî	Tînah xewn, û merdax temmûz, û ab qedr e,
			Mef'ûlun fa'îlatun Mef'ûlun fa'îlatun	Pedrûd wida' xuwestîn, mûyê heram e bane,
10	25	125	Remel	Ahramen ahîrîmen ahîrîne ehremen
			Fa'îlatun Fa'îlatun Fa'îlatun fa'îlat	Ahîren ehîrîne ehren cumle şeytan, do ye dût,
11	10	33	Hezec	Pevazî purşewat e, kesê bêdîl xonokcan,
			Mefa'îlun fe'ûlun mefa'îlun fe'ûlun	Tîjîbûn e lemalem, tekebbur xodperistî,
12	9	55	Wafir	Kaşane û gulbe hucre binas!, Pîrahen e çi? Pêşîr û kiras,
			Mefa'îletun Mefa'îletun Mefa'îletun	Postan e sedî, evreng e serîr, conban e leqandin, nav e miyan,
13	15	103	Recez	Tasa û tase xemûn û melaket, tarî û tarî her du ne tarî,
			Mustefîlatun Mustefîlatun Mustefîlatun	Taras mûfûbîn, barû hesar e, badber mura'î, muhtacî ye gaz,
14	65	231	Mûtekarîb	Pejeng e kilid, û birîn e şîgar,
			Fe'ûlun fe'ûlun fe'ûlun fe'ûl	Pejûlîş perîşan, û seyd e şîkar,
Dawî	28		Hezec	Ku tenha em di bin axê bîminîn
			Mefa'îlun mefa'îlun fe'ûlun	Jihevket yû dilê şeq dê bîminîn
Gîştî	320	1155		

2.3. Şeyx Me'ruf Nodeyî û Luxetnâme-yê Ehmedî

2.3.1. Şeyx Me'ruf Nodeyî (1753-1837)

Navî wî Mehemed e, kurê Seyyid Mustafa ew jî kurê Seyyid Ehmedê Berzen-
ciye. Bi şecera malbatî bapîrê wî yê sêzdemîn Seyyid 'Îsayê Berzencî kurê Seyyid

33 Ertekin, hb, r. 98

34 Pertev, hb, r,50-60

35 Pertev, hb, r,50-128

Baba ‘Elî Hemedanî ye ku Seyyid Baba ‘Elî Hemedanî jî birayê şa’irê mezin û navdar Seyyid Baba Tahirê ‘Uryanî ye.³⁶

Şeyx Me‘ruf Nodeyî, di sala 1753 an³⁷ de li gundê Nodê welidiye. Di despêkê de li cem bavê xwe dest bi xwendinê kiriye. Paşê li gelek deveran feqîti kiriye. Di sala 1771ê de di temenê 18-19 e salî de li cem Mela Mehemedê Xezayî icaza ‘ilmê wergirtiye. Di sala 1837 an de çûye ser dîlovaniya xwe.³⁸

Şeyx Me‘ruf Nodeyî, ‘alimekî mezine û zanayekî bê hempa ye. Di ‘ilmê Nehvê, Serfê, Me‘anî, Beyan, Wed‘, Âdâb, Behs, Mûnazere, Fiqih, Hedîs, Ūsûl, ‘Eqaid, ‘Erûz û Qaffiye û Faraîzê de gelek serkeftî û pêşkeftiye. Di mijarê cûr be cûr de bi zimanê Kurdî, Farsî û ‘Erebî 45 berhem li pey xwe hiştiye.³⁹

2.3.2. Navê Berhemê yê Orîjînal

Şeyx Me‘ruf Nodeyî navê ferhenga xwe di destpêka berhemê de di beyta 8 an de weha diyar dike:

Lî haza nawem na ‘**Ehmediye**’

Wellahe ercû islahî’n-niyye⁴⁰

2.3.3. Sedema Nivîsînê û Mêjûya Nivîsandina Wê

Sedema nivîsandina vê berhemê di destpêka berhemê de di beyta 7 an de Şeyx Me‘ruf Nodeyî diyar dike ku ji bo lawê xwe Ehmed amade kiriye. Li gor agahiyên li ber desta ev behrem di sala 1790 î de hatiye nivîsandin.⁴¹

*Ta kî ferzendem **Ehmed** bê te’eb*

Şewed danayê luxatê ‘ereb

2.3.4. Taybetmendiyên Şiklî

Ferhenga Kurdî (Sorani) û ‘Erebî ye. Çawa ku nivîskarê berhemê di destpêkê de di beyta 9an de destnîşan dike ku ev berhem ji destpêkekê û du beşa pêk hatiye.

Bi dû bab kîtab mî şewed kemal

*Yek babê **esma** û yek babê **ef’âl***

Di ferhengê de bi giştî wateryên 1444 bêjeyên ‘erebî hatine dayin. Berhema li ber destê me wênedar e. Bi tevahî 348 wêne di berhemê de bi cih bûne. Di gelek

36 Babê Lalo (Kemal Reûf Mehmed), (2004) ‘*Eqîdey Îman-‘Eqîdey Kurdî*, Xalid Şarezorî Neqşebendî, (Komkirin û Serastkirin), Weşanên Aras, Hewlêr, r.136

37 Siddîq Sefizade Borekî, (2008), *Mêjûy Wêjey Kurdî*, Weşanên Aras, Hewlêr, Berg.2, r.699

38 Babê Lalo, hb.137

39 Babê Lalo, hb.139-140

40 Di vê xebata li ser *Luxetnameyê Ehmedî* de berhema *Luxetnameyê Ehmedî*- Wênedar, rastkirin û wênekirin bi tekoşîna ‘Ebdurrehîm Mehmûdî, Întişaratê Kurdistan, çapa nehom, sal 1391 me ji xwere kir çavkanî.

41 Pertev, hb. r.526

rûpelan de wateyên hin peyvên kurdî wek jêrenot hatine dayin.

Ev ferhanga meyî mewzûn bi giştî ji 373 beyta pêk hatiye. Beşa destpêkê 13 beyt e. Beşa yekem pêşî bi ‘erebî bi sernavê ‘El-Bab’ul-ewwel û fî tercemeti’l - esmaî’ paşê bi kurdî ‘beşê yekem le wergeranî nawekan da’ hatiye binavkirin. Ev beş bi 343 beyta hatiye avakirin.

Di dawîya beşa yekem de wek binbeşa çar qit’e bi cih bûne. Qit’a yekem bi navê ‘Qet’e yekêter le behrê remel, Fa’îlatun, Fa’îlatun, Fa’îlatun’ e û 21 beyte. Qit’a duwem 7 beyte û navê wê Qet’e yekêter le behrê serî’e. Qit’a sêyem navê wê ‘Qet’e yekêter le behrê remel’ e û 4 beyte. Qit’a çara ji 29 beyta pêk hatiye û bi ‘Qet’e yekêter le weznê Reqş’ hatiye navdan.

Beşa duwem ji 17 beyta pêk tê. Di vê beşê de wateya lêkerên sê herfî ji zimanê ‘Erebî hatiye dayin. Navê vê beşê bi ‘Erebî; ‘El-Bâbu’s-sânî fî tercemeti’l-ef’alî’ û bi kurdî ‘Babê duwem le wergiranî fî’lekanda’ ye.

Di berhemê de bêjeyên ‘erebî dinav kevaneka de hatine nivîsandin.

Di Luxetnameyê Ehmedî de Hejmara Beyta û Mînakên Beyta		
Beş	Hejmara Beyta	Beytek Jê Beşê
Destpêk	13	Bi namê Xweday heyyê la yemût Perwerdegare mulk û melekût
1	343	re ‘s sere, ‘eyn çawe Beden qalib, îsim nawe
2	17	zehere, lah, beda; derket ‘Erîfe nasî, be’ese nardî
Giştî	373	

2.4. Dilbikulê Cizîrî (Abdûlkadir Bîngol) û Nûbihara Mezinan

2.4.1. Dilbikulê Cizîrî (Abdûlkadir Bîngol) (1953-)

Dilbikulê Cizîrî (Abdûlkadir Bîngol), Di sala 1953yan de li navenda Cizîrê hatiye dunyayê. Di destpêkê de li cem bavê xwe dest bi xwendinê kiriye. Paşê li herêmê xwe li cem gelek melayan feqîti kiriye. Perwerdeya pêşîn û navîn li Silopya, Cizîr û Şirnexê quta kiriye. Di sala 1995 de beşa Civaknasiyê ya dusale qedandiye.⁴²

Di sazîyên dewletê de karê fermî kiriye û di sala 1996 da malnişîn bûye. jiyana xwe li bajarê Cizîrê didomîne. *Evdilahê Mînyewî* (werger), *Gotinên Pêşîyan* û *Biwêjên Herema Botan, Kulîlkên Baxê Botan, Rîsaleya Nameyan-Mektûbata Bedî’uzzeman, De Were Bikene/Nekene*, navên berhemê wî ne.⁴³

42 Ertekin, hb, r. 100

43 Di vê xebata li ser Dilbikulê Cizîrî (Abdûlkadir Bîngol) û *Nûbihara Mezinan* de; Dilbikulê Cizîrî (2014), *Nûbihara Mezinan*, Weşanên Nûbihar, Çapa yekem, Îstanbûl, me ji xwere kir çavkanî.

2.4.2. Navê Berhemê yê Orîjînal

Dilbikulê Cizîrî di benda sêyem di beyta 41ê de dibêje min rêça Şeyx Ehmedê Xanî ji xwere pejirandîye. Ji bo vê yekê navê berhema xwe 'Nûbihara Mezinan' daniye. Nivîskar navê berhema xwe di pêşgotina berhemê de anîye ziman ku ev pêşgotin nesre.

*Min girtiye rêy **Mela û Xanî***

Kurdî bibim ez semayê banî⁴⁴

2.4.3. Sedema Nivîsînê û Mêjûya Nivîsandina Wê

Nivîskar ji bo ku ji zimanê xwe re xebatekê bike, nehile wînda bibe û agahiya dost û dujminan jê çê bibe ku Kurdî zimanekî dewlemend e ev ferheng amade kiriye. Nivîskar van hestên xwe di beşa sêyem de di beytên 35-39an de aniye ziman. Tarîxa nivîsandinê ne diyar e lê berhem di sala 2014an de di nava weşanên Nûbiharê de li Stenbolê derçûye.

Min xwest ji ziman re kim xebatê

Bona wejîna wê kim lebatê

Rizgar bikim ez nebîte wînda

Da ew nemirit li şehr û gunda

Hazîr bikim ez bi Kurdî ferheng

Da ew di dinê de bit xwedî deng

Emma ne wekî yê dîn bi pexşan

Helbesteke rewneq û we rexşan

Da dijmin û dost û tev de bende

Hay jê çêbe Kurdî dewlemend e⁴⁵

2.4.4. Taybetmendiyên Şiklî

Berhem ji destpêkek pexşan û du beşa pêktê. Beşa yekem ji bîst û şeş bin beşa ava bûye. Ev beş wateyên bêjeyên tirkî bi kurdî dide, yanî ev beş Tirkî-Kurdî ye. Beşa duwem ji heft binbeşa pêktê û ev beş Kurdî-Kurdî ye.

Destpê dikim ez bi navê Ellah

Meqsûd Ew e her ji bo me wellah

Nivîskar navên beşên berhemê bi 'Bir' navdar kiriye û binbeş jî bi 'Bend' a ji hevû dû qetandiye. Di birra yekem û benda yekem de bi 14 beyta pesnê Xweda

44 Dilbikulê Cizîrî, hb. r. 21

45 Dilbikulê Cizîrî, hb. r. 21

hatiye dayin. Di heman *birrê* û *benda* dûwem de di bin navê ‘Gazî bo Xweda’ bi 21 beyta gazind û hewara xwe bi Xwedê dike û dû’a dike.

Ewwel tu yî bil ji wê jî Axir

Batîn tu yî hem digel wê Zahir

Di Birra yekem de Benda sêyem ku navê vê bendê ‘Zimanê Bêxwedî’ ye li ser grîngîya zimanê zikmakî disekine. Ev bend ji 45 beyta pêk tê.

Derd û meraqa zimanê mader

Zil da û di qelbê min de da der

Benda çarem ji Birra yekem bi pend û nesîheta destpê dike û paşê bi ferhengê didome. Hejmara beytên pend û şîreta 12 ne. Ev bend 1087 beyt e. Di serê benda de nivîskar beytên pend û şîreta bi cih kirîye. Hejmara van beytên pend û şîreta ji yekê heta 12a tê guhertin.

Bira duwem ji heft benda pêk hatiye. Ev beş Kurdî-Kurdî ye û ji 321 beyta pêk tê.

Ferheng bi wezn û bi behr û qalibên ‘erûz’ê hatiye nivîsandin. Kêşa qalibên ‘erûzê’ wek jêrenot li bîrê rûpel hatiye nivîsandin. Di berhemê de pênc qalibên ‘erûzê’ hatiye bikaranîn.

Di ferhengê de bi giştî hejmara peyvên Kurdî 13.104e û hejmara peyvên Tirkî 8.268 in. Di beşa yekem de 2976 û di beşa dûwem de 321 beyt, bi giştî 3297 beyt cih girtiye.⁴⁶

BİRRA YEKEM				
BEND	NAVÊ BENDÊ	HEJMARA BEYTA	KÊŞA 'ERÛZÊ	BEYTEK JÊ BENDÊ
